


«Xelkê Efrînê ji agirekî dikevin nava agirekî din»



Kurdistan-Hesen

Omer

Roja 7ê vê mehê çalakvan Mihemed Ebdulatîf, ku bi navê “Ebû Xenûm” dihate naskirin li bajarê Babê ji aliyê grûpa Hemzat ve hatibû kuştin, vê yekê jî

karvedan û nerazîbûna xelkê li pişt xwe anî û piştredî navbera grûpên çekdar de şer û pevçûn li Bab û Cerablusê derketin û gihişt Efrîn, û ev çend roj in ev alozî li Efrînê berdeham in,

niha rewşa Efrînê metirsîdar e û pêşeroja vê rewşê jî nediyar e. Welatîyên Efrînê ji vê rewşê jî gelek dilgiran in. Welatîyek dibêje, xelkê me ji agirekî dikevin nava agirekî din, berî niha

çekdarên PYD û grûpên çekdar û niha jî Desteya Tehrîr El-Şam, bi rastî xelk bêzar bûne, û heger rewş berdeham bike Kurdên mayî jî dê koçber bibin. Welatîyekî din jî dibêje, ev rewş bi

erêkirina Tirkiyê hatiye kirin, û hêdî hêdî Tirkiyê dest ji hin grûpan berdide, pêwîste civaka navdewletî karekî cidî ji bo rewşa Efrînê bikin, heta ku xelk ji vê rewşê rizgar bibin.

Rewşa Serêkaniyê û Girê Sipî

ENKS di sêyemîn salvegera operasyona Tirkiyê û grûpên çekdar li ser Serê Kaniyê û Girê Sipî, kiryar û tawanên grûpên çekdaran şermezar dike û daxwaz ji

civaka û navdewletî û Tirkiyê dike, sînorekê ji van tawanên re deynin û rêveberiya wan deveran radestî xelkê wê yê resen bikin.

Rûpel—2

Henan Cefer dîwana xwe belav kir

Henan Cefer, dîwana xwe ya bi navê “Hêviyên Baskoyî” belav kir ku hejmareke helbestên evînî û Kurdewarî li xwe digre, Henan Cefer dibêje, dîwana wî bi

giştî li ser êş, bêzarî, koçberî, dizîn û talan, û yekbûn û lihevkerinê herwiha çend helbest evînî, nemaze li ser rewşa Efrînê û Kurdewariyê.

Rûpel—4

Têkoşer Nûredîn Zaza nayê jibîrkirin

Rûpel—3



«Pêwîste sînorek ji kiryarên grûpên çekdar re were danîn»

Kurdistan

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS), di sêyemîn salvegera operasyona Tirkîyê û grûpên çekdaran û êrîşa li ser Serê Kaniyê û Girê Sipî de, kiryar û tawanên grûpên çekdaran şermezar dike û daxwaz ji civaka û navdewletî û Tirkîyê dike, sînorekê ji van tawanên re deynin û rêveberiya wan deveran radestî xelkê wê yê resen bikin.



**Divê Tirkîyê,
Emerîka û
Rûsiya rê li ber
van kiryarên
bigrin**

Sekreteriya Giştî ya ENKS 9ê Cotmeha 2022an di daxuyaniya xwe de ragihand, "Hêzên Tirkîyê bi hinceta parastina ewlehiya xwe ya netewî ji hebûna PKK'ê û avakirina herêmeke ewle, êrîşî Serê Kaniyê û Girê Sipî û herêmên di navbera wan de kir û ligel komên çekdar ên ser bi wê ve di çend rojan de ew herêm xistin bin kontrola xwe." ENKSê di daxuyaniyê de diyar kir, "Piştî ku dewleta Tirkîyê bi Amerîka û Rûsyayê re gihîşt du peymanên cuda û



erêkirina (HSD) li ser wan her duyan, operasyonên leşkerî rawestiyên. Di xalên peymanan de tekezî li ewlehî û parastina sivîlan û mal û milkên wan hate kirin, lê ew yek bê pabendî ma." ENKS diyar kir, di encama operasyonên leşkerî de, bi deh hezaran xelkê herêmê ji hemû pêkhatayan, neçar man ku koçî bajar û gundên derdorê bikin ku di salên borî de di nav şert û mercên dijwar de li wan cihên dimînin. ENKS destnîşan kir, "Grûpên çekdar ên ku li Serê Kaniyê û Girê Sipî bi cih bûne, tawan û bînpêkirin li dijî sivîlan kirin, wek dizî û

talankirina mal û milkên xelkê û bicihkirina malbatên xwe di wan malan de û. Gelek welatîyên Kurd ên bêguneh ên ku di malên xwe de mane jî, tên revandin û eşkencekirin, ji bo ku wan bi darê zorê fîdyeyê bidin yan jî dê bêne kuştin."



**HSD rêkeftinên
Tirkîyê bi
Rûsiya û
Emerîka re erê
kiribûn**

ENKS tekez kir jî, "Tevî ku di rapora

Komîteya Lêkolînan a Navdewletî de hatin gotin ku tiştên li van deveran tên kirin, digihin asta tawanên şer jî, kiryarên grûpên çekdaran nehatin rawestandî." Encûmena Niştimanî ya Kurd di sêyemîn salvegera êrîşa li ser Serê Kaniyê û Girê Sipî de, kiryar, bînpêkirin û tawanên ku li dijî gelê Serê Kaniyê û Girê Spî û Efrînê jî tên kirin, bi tundî şermezar dike. Her wiha ENKSê bang li civaka navdewletî, Netewên Yekgirtî û welatên pêwendîdar bi pîrsa Sûriyê yê wekî Amerîka, Rûsiya û Tirkîyê dike ku dawî li êş û

azarên xelkê van deveran bînin û bi cidî kar bikin ji bo derxistina komên çekdar û dûrxistina wan ji bajar û bajarokan, ji bo hêskirina vegera koçberan bo malên xwe. ENKS tekezî li ser wê yekê jî dike ku rêveberiya Girê Sipî, Serê Kaniyê û Efrînê ji bo ji xelkê wê yê resen were radestkirin, û hemû kesên ku tawan li dijî gel û milkên wan kirine, bêne dadgehkirin.



**Pêwîste koçber
vegerin ser
mal û milkên
xwe**

Nûredîn Zaza.. têkoşerekî bêhempa


Kurdistan

Nûredîn Zaza di roja 15ê Sibata sala 1919, li Madenê hatiye dinyayê û ev mirovê şareza û rênîşanderê Kurd roja 7ê Mijdara sala 1958'an li Swisrayê, bajarê Lozanê koça dawî kirîye. Piştî têkçûna şoreşa Şêx Seîd û bûyerên xirab li Bakurê Kurdistanê, desthilata tirk, Dr. Nafiz kiribû bin çavan de û derfet lê teng kiribû û emrê sergûna Izmîrê jê re derxistibû. Vêce ew mecbûr bûbû ku çarekekê ji xwe re bibînê. Di sala 1930î de, ew û bira yê xwe yê piçûk Nûredîn binxet dibin Sûriyê ku di bin mandata Fransayê de bû. Dr. Ehmed Nafiz, kesatiyeke hekîm, tekûz û mêrxas bû.



Zaza jiyana xwe ji bo miletê Kurd terxan kiribû

Hatina wî ya Kurdistana Sûriyê bû hêzeke nû ji Xoybûnê re. Ew roleke girîng tê de dileyîze û di salên çilan de serokatiya wê dike. Di warê bijîşkiyê de Dr. Nafiz bi kar û xebateke mezin li herêma Cizîra Sûrî dirabe. Wê çaxê, êş û nexweşiyên weke êşa zirav, melariya, tîfo, sorik û xûrî belav bûn û mezin û piçûk bi wan êşan diçûn. Dr. Nafiz êşên cih nas kirin û li ser destên wî yên pîroz bi dihên hezran nexweş saxbûn. Ji lewra, baweriya xelkê bi bijîşkiya Dr. Nafiz zêde bû û nav û dengên wî ne tenê li herêma



Cizîrê, lê belê di Sûrî tevî de belav bûbû. Nûredîn vêce, li Kurdistana Sûriyê di bin sih û perwedeya Dr. Nafiz de mezin dibe. Ew ne tenê bira ye jê re, lê belê ew dibe bav û mamoste û rêber jî. Herwesa, Nûredînê piçûk, di nav civata welatparêz û girgirekên kurdan de mezin dibe. Di salên sihan de, gelek şoreşger û rewşenbîrên kurdan ji ber zilm û zora rêjîma Atatürk ya nijadperest binxet bûbûn Sûriyê. Ji wan Memdûh Selîm, Mîr Celadet û Kamîran Bedirxan, Qedrî Beg û Ekrem Cemîl Paşa, Hemze Begê Miqîsî, Haco Axa, Evdirrehman Axayê Eliyê Ünîs, Nûrî Dêrsimî, endeziyar Arif Ebas û hin dîtir. Wê tesîra wan camêran di warê netewe-perweriyê de li Nûredîn hebe. Bi wext re, wê Nûredînê dagirtî bi rihê şoreşvaniyê bide ser şopa wan û barê kurdîtiyê giran bigire xwe û doza mafên gelê xwe yê kurd bike. Di sala 1956an de, Nûredîn Zaza du karên pir girîng pêk tîne. Yê pêşî, ew doktoriya di zanistên perwedeyiyê de ji zanîngiha Lozanê werdigre. Karê didwan, ew Yekîtiya Xwedekarên Kurd li Ewropayê didamezrîne. Dûv re, ew dide rê û divegere

Sûriyê. Di bîranînên xwe de Bîranînî, Dr. Nûredîn Zaza dinivîse: “di paşiya hezîrana sala 1956an de, ez bi hisret bûm ku ez tişteki ji kurdan re bikim. Min rabû da rê, di rêya deryayê re Îtalya-Bêrût, berê xwe da Sûriyê. Li Bêrûtê, piştî 9 salan ji mayîna li xurbetê, bira yê min yê mezin Dr. Nafiz û hin dostên me yên dilsoz, hatibûn pêşwaziya min. Çawa ez ji gemiyê peyabûm, min naskir ku Kurdên Sûriyê ji mêj ve li hêviya vegera minin. Vêce gelo ezê bikaribim wan ji bin sitem û te’dariyê xilas bikim û maf û daxwaz û meremên wan di heyif û salên werin de bi cih bînim, yan na. Li Sûriyê, Nûredîn Zaza dibîne ku rewşa miletê kurd xirab e. Ji kinarekî ve, kurd ji nijadperestiya partiya Be’s di metirsiyê de ne. Li kinarê dîtir, Partiya Komunîsta Sûriyê, ya qaşo Internasyonalîst, xwe ji neteweya ereban re kiribû parêzer, lê li dijê kurdan derdiket, hinga doza mafên xwe yên neteweyî dikirin û ew bi şovînzîmê tometbar dikirin. Nûredîn Zaza dinivîse: “di rewşeke wesa, min avakirina rêxistineke ku karibe nasnama gelê Kurd biparêze û doza mafê wan yên rewa bike, pêwîst didît. Li Şamê,

xwendekarên Gemnazyom û dibistanan pêkanîna wê projeyê ji min dixwestin. Herwesa, welatparêzên kevnare, mela, muxtar, û cotaryên sade di pêkanîna wê projeyê de, pîştta min digirtin û di paşiya sala 1957an de, ew xewn pêkhat û Partiya Demokrata Kurdî li Sûriyê (PDKS) hate damezrandin. PDK-S, ji serokatiya xwe re, Nûredîn Zaza dihilbijêre û di demeke kurt de gelek kurd tevlû Partiyê dibin. PDKS, karekî mezin di warê siyasî û rewşenbîrî û civakî di nav kurdan de dike, ji lewra nav û deng û bandora wê xurt dibe di nav kurdan de. Lê di salên 1958 - 1961ê de (dema yekîtiya Sûrî û Misrê), hikim di destê rêjîma Cemal Evdul Nasir ya dîktatûr de ye. Di wan her sê salan de rewşa siyasî, ewlekarî û aborî li Sûriyê kambax dibe. Berdevkê Nasir li Sûriyê Evdihemîd Elserrac û hêzên parastinê, te’dariyeke xirab li xelkê dikin û nemaze li kurdan û helbet li PDKS, ku hebûna wê weke xetereke mezin li ser yekbûna dewleta erebî dibînin. Vêce rêjîma Nasir, hemû bela û bêtarên xwe yên siyasî û aborî dike sukra gelê kurd de û PDKS de. Di çend rojan de, li dora 5000 endamên PDKS û serokê wê Nûredîn Zaza têne girtin. Piştî çendkê, behra mezin ji hevalan têne berdan. Nûredîn Zaza û 31 heval di hepis û zindanên Helebê û Şamê (Mezê) de girtî dimînin. Girtiyên kurd gelekî têne lêxistin û îşkencekirin. Belê, behra mezin ji jiyana Nûredîn Zaza di siyasetê de çû. Lê di

heman demê de, ew nivîskar û rewşenbîrekî mezin bû. Wî bi sedan gotar di rojname û kovarên kurdî Hawar û Ronahî û biyanî de nivîstibûn.



**Pêwîste
têkoşerên wek
Zaza neyên
jibîrkirin**

Herwesa wî Destana Memê Alan ji nûve çapkiribû û pêşgotineke hêja jê re nivîstibû û di sala 1982an de, wî pirtûkek bi navê Ma vie de Kurde (“Jiyana min a Kurdî, yan jî Hewara miletê Kurd”) nivîstibû, tê de behsa jiyana û xebata xwe ya netewî di ber pîrsa kurdî û Kurdistanê de kiribû. Her wisa Nûredîn Zaza giringiyeke mezin dida pîrsa zimanê kurdî û pêşxistina wî. Di banga xwe de Nûredîn Zaza ji kurdan re gotibû: “Gelî Kurdan! Heger hûn naxwazin ji hev taromar û winda bibin, berî her tiştî zimanê xwe bixwênin û bidin xwendin. Lê heger hûn dixwazin xwe nasbikin û xwe bidin naskirin û hizkirin, bi hevaltî û dostaniya miletên din bi pêş ve herin û bi rûmet û ser bilindî bijîn, dîse zimanê xwe bixwênin û bidin xwendinê Dr. Nûredîn Zaza salên xwe yên paşî li Swisrayê dimîne. Li wir, ew di 1972an de bi keçeke swîsrî bi navê Gilberte Favre re dizewice di 7ê çiriya paşîn a 1988an de, ji ber nexweşiya penceşêre jiyana xwe ji dest da.

Henan Cefer: Helbest ji bo min helwest e

Kurdistan Soz Xelîl

Henan Cefer, dîwana xwe ya bi navê "Hêviyên Baskoyî" belav kir ku hejmareke helbestên evîni û Kurdewarî li xwe digre, Henan Cefer ji Rojnameya Kurdistan re got, helbest ji bo wî helweste berî ku helbest be.



Pêwîste rojek ji bo helbesta Kurdî were destnîşankirin

*Tu dikarî ji me re behsa naveroka dîwana xwe bikî?

Bi gelemperî li ser êş, bêzarî, koçberî, dizîn û talan, û yekbûn û lihevkerinê herwaha û çend helbest evîni, nemaze li ser rewşa Efrînê û Kurdewariyê

*Gelo çima "Hêviyên Baskoyî" wek navnîşan hilbijartî ye?

Berî her tiştî pir hêvîdar bûm ku rewşa min paşerojê ji vê baştir bê lê mixabin ev hêviya pir kesan bû. Hêvî tevger e, têkiliye, paşeroj e, hêvî deyaqa jiyane ye, bilindbîna rêya hezkiriyê ye, lê demê çareser nebê baskoyî ye, raste hêvî bi tenê ne bese

û bi hêviyan mirov singe spî nabîne lê deyaq e û roniyê.

*Heza te ya çî helbestê bêhtir heye klasîk yan nûjen?

Kilasîkî xweş e, lê yek tê girêdan bi dawîbira helbestê û li gotinên hevwater bigerê. Lê helbestên nûjen yan azad, ez dibînim hêsan e yek û ya duyem mirov dikare ramanên xwe bi cih bîne, û bigihîne xwandebaran bi bêjeyên nazik û xweş.

*Jibilî helbestê tiştêkî din dinivîsî?

Heza min pir ji çîrokan re tê li ba min pitûkek çîrokan amedeye lêvegerê dixwezê, yek ji Hayku amedeye û du pirtûkên helbestan tê de dixebitim hene.

* Tu pêşeroja helbesta Kurdî çawa dibîni?

Helbesta Kurdî roj ji roj pêşdikevê, lê mixabin rexnevan kê in ku ev helbestan rexne bikin ji pêşketina helbestê û ger yek min rexne bike li xweşiya dilê min ê were, hêvîdarim roja helbesta Kurdî li her cihekî çê bibê



û xelkê vexînin ku helbest bêhtir were nasîn.

*Helbest ji bo te çî ye?

Helbest kaniye, di hinavê siruştê de dixulxulê. Helweste berî ku helbest bê, zanîn e, xwandin e, wergera êş û şahiya milete, hêvî ye, xewn e.

*Berhemên te çî hene?

Pirtûkek çîrokan amedeye û yek Hayku ya Kurdî û du pirtûk helbestan tê de dixebitim.



**Efrîn
pencera
jiyana me ye**

* Tu bi xwe xelkê Efrînê yî, ji bo Çiyayê Kurmênc çî dibêjî?

Efrîn pencera jiyana

me ye, xweda xelkê herêmê biparêzê, hêvîdarim her kes vegeerê mala xwe lê hêviyên baskoyî ne çimkî heya Efrîn çê bibê jî hin kes venagerin nemaze yê li Ewropa.

Henan Cefer kî ye?

Ez li gundê Gorda ji dayîk bûm û di bin baskên kurdewariyê de li qirac û çiyayên gund mezin bûm, min xwandina xwe serate li gund xwand paşê min xwandina li bajarê Heleb berdewam kir min peymangeha pêşesaziyê stand. Rojekê di sala 1984 an de ez li pitûkxaneyê pirtûk sedikirin bi lêrasthatina alêfbaya kurdî ya mam Osman Sebrî hatim yekser min kirî û ez jê fêrî Kurdî bûm paşê bi demê min dest bi nivîsê kir yek yek xewatêr

û hin kurteçîrokên ajalan û civakî lê bi zimanekî şikestî bê rêziman wek tê bilêvkerin bi encama rewşa min xirab ez ji nivîsê dûrketim lê belê ticaran ez ji xwandinê dûrketim, her ku derfet çê biba min bêhnvedana xwe bi xwandinê vedida, bi qeyrana sûriyê re em hatin herêma Efrînê û li navçeya Cindirêsê niştêcî bûn, di rêya dostan re min saziya fêrbûn û parastina zimanê kurdî naskir, heya vê demê min nizanî rêzimanê kurdî çî ye ez hingê fêrî bûm û min dest bi nivîsa helbestê kir û min sûda pir ji siya wêje girt bi rêveberiya mamoste Merwan Berekat. Li dawiya sala 2016 an em koçberî tirkîyê bûn û niha ez li Stenbolê dijîm.